NEWROZ



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993

__Xebat ji bo :__ *** Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
*** Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
*** Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .**

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
*Email :* **Newroz95@hotmail.com**

Hejmar (80) Hizîran 2008 z-2620 k Buha (15 ) ps

## Di 51 saliya damezrandina Yekemîn rêxistina siyasî a kurd de li Sûriyê

**R**oja 14-ê Hezêrana sala 1957- an , bona gelê kurd li Sûriyê rojeke dîrokî ye , ji ber ku di wê rojê de , yekemîn partiya siyasî a demokratîk di nav Kurdên Sûriyê de hatibû damezrandin û ji raya giştî re hatibû aşkerekirin . Lewre jî li ba xebatkarên siyasî yên kurd bûye bîranîneke ciyê rêz û hurmetê

Di vê sirê de , hêjay gotinê ye ku , camêrên ku di wê civîna dîrokî û berpirsiyar de , ya ku li Helebê li 14.06.1957-an beşdar bûbûn , erk û ustibariya birêvebirina siyasetê û birêxistina partiyê li destên xwe gerandibûn û hildabûn ser milên xwe , ev her heft birêz bûn: 1- Osman Sebrî. 2- Reşîd Hemo. 3- Hemîd Derwîş. 4- Mihemed Elî Xoce . 5- Xelîl Ebdela . 6- Hemze Niwêran . 7- Şewket Henan.

Dûv re kêmzêde piştî salekê , rewşenbîrê dilsoz Dr. Nûredîn Zaza , helbestvanê navdar Mile Şêxmûs Cegerxîn û hin kesayetiyên dî yên xwedî rol û cîgeh , derbazî nav rêzên partiyê dibûn , ew di nav civakê de geşdikirin û dixemilandin .

Xelkê kurd di bin kartêkirina hestê netewî de , xwe li dora vê partiyê dida hev û lê dibû xwedî , bihêviya ku , rojeke şad û bextewar bi ser wan de bê , ziman û rûmeta wan ya netewî parastî be , û ligel ereban bi wekhevî û bi hevre bijîn .

Di wan deman de – ango ji beriya 50 salî - jiyan û rewşa civaka me kurdan bi tevahî pir li şûn û paşeketî bû , ji kêmxwendin û nezaniyê de bigir , di xizanî , perîşanî û nexweşiyan re derbaz be , ta tu bigihê qirêjî û kirêtiya ew ton dijatiya navxweyî ya êl û eşîran , digel rola ocaq û olperestan ya tersî pêvajoyê….Di vê çerçewa zor dijwar de , partiya kurd karibû rê li ber xwe biqelêşe û xebata xwe bidomîne .

Bi ser de jî , pêwîste bête zanîn û ji bîr nebe ku , di wan deman de , netenê helwesta karbedestiya dewletê , lêbelê sîstema hiş û helwestên hemî partiyên siyasî yên wê hîngê , ji hebûna pirs û partiyeke kurd re li Sûriyê digotin Na û li dij bûn .

Îro roj , dem û dewran serûber hatiye guhartin , jiyan û berjewendiya xelkê me yê kurd li Sûriyê baştir hatiye **D.R.( 11 )**

www.arsivakurdi.org

# Weşana Deng
# Û
# Çend têbînan

**- Memê Alan -**

Piştî ez rastî hejmara 90 î ji weşana Deng di entirnêtê de hatim , ez pir pê kêfxwaş bûm . Wêlomê min bi lez çavên xwe li nav rûpelên wê gerandin , û navnîşanên wê xwendin . Bêtirîn sergotara hejmarê ya bi navnîşana \\ **Rewşa hundirî girijîtir dibe** // bala min ber xwe kişand . Min rabû hûrik- hûrik sergotar xwend , herweha min da ber nirxwandin û pîvanê . Berî ku , ez nirxwandina xwe ji sergotarê re derxim hole , min telîfonek ji endamekî wê Kevin ku , min nasdikir re vekir , da ku silavekê lê bikim û çawabûna nivîsandina wê jê bipirsim . Ji min re got , dibe ew ji erebî hatibe wergerandin , bi xwe ez jî di wê gumanê de bûm . Piştre min dît hêja ye , ku ez bi çend têbînan , sergotara hejmarê ji desteya birêvebirina weşana Deng û xwenerên wê re binirxînim , belkîm bi kêrî rastnivîsa zimanê me , û pêşxistina weşana Deng were .

*- Pêşî armanc ji nivîsandina mijarekê bi zimanê dê , fêrkirina zimên û têghiştina ramanekê ye . Ji ber van sedemên jêrîn , min ev herdu armanc di sergotarê de kêm dîtin .

1- Sergotar ji zimanê erebî hatiye wergerandin . wegerandin Bixwe jî ji zimanekî ta zimanekî dî – ger wergêr hostebe – reseniya mijarê weke heye nahêle .

2- Wergerandin hostatîk jê re divê , yanê divê wergêr baş bi herdu zimanan zanibe , û baş têbighê naveroka mijara resen , paşê wê naverokê bi zimanê nû birêse . Mixabin , xwediyê sergotara hejmarê bi nezanî ew wergerandî . Wî gotara erebî dayî ber xwe , û hergotinek wê yeke kurdî – dibe pir jê ji ferhengekê derxistibe , û wateya bêjeya erebî ndabe jî – li şûnê danî be . Wêlomê herçûye sergotar dûrî rastnivîsa zimanê kurdî bûye , ji hev ketiye , û naveroka wê wendabûye . Yanê xwenerê wê kêm jê fêrî zimanê dê dibe , û kêm têdighê naveroka wê jî .

Ez ji weşana Deng ya hêja û desteya wê yê bira lêborînê hêvî dikim . Lê , li dawiya dawî , armanca min ji vê nirxwandinê sûdegirtin , pêşxistina xwendin û rastnivîsandina zimanê dê , û pêşxistina vê weşana pîroz e .

# Belê ezbenî derewînm

**Canşêrê Sencqî**

Teq-teq.. Qazî li masê xist û got: Şiyaro, bibore.. derewên et nahêlin ku, em te ji rûniştvanên Almaniya qebûl bikin. Derewên te ev in :

Yekem : Gundê te ARZANA ji sînora Tirkiyê bîst û pênc K/m bêtir dûre û ew ne di KEMBERA erebî de ye, weke te gotiye.

Duwem: Tu kurê Çeto yê xencerî û nasnama we heye, ne ewke te gotiye ku, ji qurbanên Jimara Awerte yî.

Teq-teq.. Qazî got: fermo Şiyar tu çi dibêjî. Şiyar : Belê ezbenî , ya te raste, ez derewîn im. Fermo mamuste, were li welarê me Sûriyê bijî, eger wîn rastgo mayîn, wê hîngê ji mire bêje qurban!?..

Temenê min bîst û heşt sal in. Yek roj azadî min nedîtiye, li welatekî bê destûr mezin bûme . Min dewre bi taştê û şîvên xwe re xwarî û vexawriye . Bi viran tenê jiyan li welatê me didome.

Belê ezbenî ya te raste ez derewîn im

www.arsivakurdi.org

# Dizên berê jî, ne weke yên vê demê bûn

Rêberê Silîvî

Hê jî, weke xewnekê tê bîra min, buhuştî **Seyid Hesenê Bêcirmanî** ku hevalekî bavê min bû, gelek caran ew dihate şevbuhêrka me, çîrok û serpêhatiyên bav û bpîran ji civatê re digotin. Yek ji wan jî ev bû:

Li gundekî ji gundên kurdan, ji nişka ve gayê cot ê mirovekî winda bû. Kesî nizanîbû gelo ew hatiye dizîn yan jî gur û keftar rastî wî hatine û ew xwarine. Dilê mêrik li gundiyekî wî xira bû ku wî gayê wî dizî be. Rabû çû mala wî, di navbera xwe û wî de jê re got: Bira, ez çiqasî didime hişê xwe, ez dibêjim ji te pêve kesî Ga yê minî reş ne biriye, vêca eger te biribe, ji kerema xwe re bê sergêjî wî vegerîne cihê wî, bera dilê te di cih de be, ez ji kesekî re jî nabêjim. Mêrik, yek ne kir dido, yekser diziya Gê da mendelê. Xwediyê Gê jê pirsî: Tê înaniya min bînî, tê li ser destê Melê sûnd bixwî?. Wî erê kir û xwe da ber sûndê.

Ji ber ku dema berê Mela li her gundekî nebûn, divabû qonaxa şev û rojekê bi rê ve herin. Serê sibehê, herduwan da kêleka hev û berê xwe dane gundê ku Mele lê hebû. Li wan bû şev, herdu westiya ne, tî û birçî bûne. Xwe berdane gundekî, li deriyê malekê xistin û li wê malê bûne mêvan. Dîn û bala xwe dane xwediyê malê, çawa ew dilezîne hema livînan ji wan re radixîne û ji wan dixwaze ku bi lez razên, bê ji wan bipirse ka ew têr yan birçî ne. Wan jî dilê xwe bi hatina sibê xweş dikir, ji xwe re digotin, sibe emê rabin têr taştê bixun û bidine ser riya xwe.

Berbangê, xwediyê malê mêvanên xwe şiyar kirin, ji wan re got nimêja xwe bikin da hun biçin, ji ber ku riya we pir dûr e. piştî nimêjê, mêrik û kufletê xwe nîska germ ji xwe re rû kirin leganekê, nan çandinê, bê ku ji mêvanên xwe re pêşkêş bikin û dest bi xwarinê kirin.

Herdu mêvanên birçî matmayî li hev nerîn, rabûn birçî ji wê malê derketin û dilşikestî dane ser riya xwe. Piştî ku hinekî bi rê ve çûn, xwediyê Gê ji mêrik re got: Bira, bi xwedê hema ez û te emê li vir ji hev xilas bibin, em naçine cem Melê, tevî ku ez dizanim û bawerim te gayê min biriye, lê hema tu ji min re bibêje ez weke vî mirovê ku em birçî ji mala xwe derxistine, bila Gayê min sed carî li te pîroz be. Mêrik da hişê xwe, ponijî, xwe da vî alî, da wî alî, got: Bira, bi xwedê bera ez bimirim û ne weke vî mirovê pîs ê çavteng bim. Gayê te li ba min e, min ew li cem hevalekî xwe veşartiye, haydê em herin gundê hevsînorê me da tu Gay ê xwe bibî!!...

12-06-2008

www.arsivakurdi.org

# Hevpeyvîn bi rêzdar

Ibrahîm Guçlu-Sekreterê TEVKURDê re,

**Ibrahîm GUÇLU** Kî ye?



Ew kurdekî Anadoluya Navîn e, sala 1949an li gundekî nêzîkî Enqereyê, li gundê Haciya hatiye dinyayê. Di dibistana navîn de, bi tesîra du mamosteyên kurd ramana neteweyî kurdî pêre çêdibe, ji sala 1967an ve, wî dest bi xebata siyasî kiriye, beşdarî di xwepêşandanên kurdan de kiriye, di heman salê de(1967), dibe xwendevanê zanîngeha Hiqûqê ya Enqerê, karê siyasî di partiyeke çep a tirk de dike. Ji bona ku ew damezirêner û serokê DDKO yê bû, digel çend hevalên xwe(Mumtaz Kotan, Sebrî Çepîk, Nezîr Şemîkanli, M. Emîn Bozarslan, Musa Enter, Dr. T. Zîya Ekîncî, Canîp Yildirim) li Enqereyê sala 1970, 8mehan dikevin zindanê. Sala 1971ê, ji ber kurdîtiyê careke din ew tê girtin, 4salan di zindanê de dimîne. Di rêxistina Rizgarî, paşê Ala Rizgarî de xbatê dike. Sala 1987an li Swêdê cîwar dibe, sala 1998an careke din ew vedigere welêt, di partiya(DKP),(Hak-Parê) de kar dike. Vêga, ew sekreterê TEVKURDê ye.

*Li destpêkê, bi navê weşana NEWROZ a ku bi zimanê kurdî li Sûriyê tê weşandin, em xêrhatina we dikin. Bêgomane, em xwe bi pêdarî û berxwedana we di ber doz û zimanê kurdî de bextiyar û serbilind dibînin, ji ber ku zimanê me, nîşan û sembola hebûna me ye.*

***1-Pirsa me ya pêşîn ew e ku hun TEVKURDê bi xwendevanên NEWROZê bidin naskirin. Ev sazî ji bo çi û kengî ava bûye, armancên wê çine, rêvebiriya wê çawa dibe…û hwd?.***

**1-TEVKURD,** kurtenavê me ye. Navê me yê vekirî **"Tevgera Yekîtîya Neteweyî ya Kurd"** e. TEVKURD, tevgereke yekîtiyê ye.

Xebata TEVKURDê di 4-ê îlona 2005-an de bi konferanseke rewşenbîr û siyasetvanên Bakurê Kurdistanê li serekbajarê dewleta kolonyalîst a Tirkiye Enqereyê, bi avabûna **"Gruba Xebatê ya Neteweyî û Demokrat a Kurd" (GRUBA XEBATÊ)** dest pê kir.

Gruba Xebatê di 27-28. 12. 2005-an de civîna xwe ya fireh û giştî li Kurdistanê û li Bajarê delal Amedê, vekirî, di saloneke otelekê de pêk anî. Di vê civînê de biryar girt ku navenda xebatê, Kurdistan û Amed be. Di encama civînê de ji bona ku yekîtiyeke siyasî ava bibe, biryara pêşxistina xebata xwe da û deglerasyonek ji reya giştî re pêşkêş kir.

**Ez, ji bona ku TEVKURDê baş bidim naskirin, ez dixwazim ji GRUBA XEBATê bi kurtî be jî behs bikim.**

Wateya peyva "yekîtiyê" gellek vekirî û xuya ye. Dema ji yekîtiyê tê behs kirin, wê demê tê wê maneyê ku hêz û parçeyên cîhê hene, gerek ew hêz û parçe bibin yek. Dema ku ji yekîtiyê tê behs kirin, dîsa gelek awayên yekîtiyê tên bîra mirov. Wek mînak, yekîtiya milet û gel, yekîtiya miletan û gelan, yekîtiya dewletan, yekîtiya siyasî, yekîtiya partiyan, yekîtiya neteweyî, yekîtiya civakî. Şirketên aborî jî, yekîtiya sermayeyê û maldarîyê ye. Konfederalîzm, yekîtiya dewletan e. Federalîzm, yekîtiya herêmên neteweyî û desthilatdarî ne. Enî, yekîtiya partî, grûbên siyasî, kes û hêzên xwediyê hevarmanc in. Mirov dikare bibêje ku di civatên modern de jiyan li ser hevbeşbûn û yekîtiyeke plural dimeşe. Yekîtî, ji bona serkeftin û mezinbûnê jî konseptek e.

Miletê kurd li hemû beşan ji bona ku rizgarî û azadiya xwe bibe serî, hewcedarî yekîtiya civakî, siyasî û wekî din e. Ev rastiya ji bo Bakurê Kurdistanê jî derbas dibe. Ji bona vê yekê, di çil salên jiyana min ya siyasî, entellektûelî de peyva ku min zêde bihîstiye û bi kar anîye peyva yekîtiyê ye. Ev jî derdixe holê ku yekîtî hewcedariyek e.

Li Bakurê Kurdistanê, ji bona yekîtiya siyasî, an jî ji bona awayên din yên yekîtiyê gelek kar hatine kirin. Di van yekîtiyan de aliyên biserketî bûne, aliye biserneketî bûne. Lêbelê gerek mirov aşkere bike ku di yekîtiyê de kurdên Bakurê Kurdistanê bi giştî serkevtî nînin. Li beşên din yên Kurdistanê jî yekîtî wek pirsgirêkekê li holê ye.

⟶

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk : Hevpeyvîn....**

Li Başurê Kurdistanê ji gelek aliyan de pirsa yekîtiyê çareser bûye. Ji çend aliyan de jî biserneketiye. Yekîtiya Hukumeta Herêma Federe ya Kurdistanê hîn di demeke nêzik de çareser bû. Lê hezar mixabin, di nav vê pirsa jiyanî de pirsên nehatine çareser kirin, hene.

GRUBA Xebatê, li Bakurê Kurdistanê, hewildana beşek kesên siyasî ji bo yekîtiyê bû. Lê pişt re ji bona ku wan kesan xwest ku grûb û rêxistinên siyasî yên Bakurê Kurdistanê di nav vê xebatê de bin, bû hewildeneke hêz, grûp û kesên siyasî ji bo yekîtiyê. GRUB, hewildaneke yekîtiya siyasî bû.

Xebata GRUBê, di 04. 09. 200-an de bi dest pê kir. Ev banga civînê, piştî ku serokwezîrê Tirkiyeyê di Tebaxa 2005-an de li Diyarbekirê di axiftina xwe de pirsa kurd pejirandibû, hat kirin. Lewra piştî daxuyaniya serokwezîr, her kesî û her hêzê ji rewşê wezîfe derdixist. Helbet piştî Teyyib ERDOGAN bûbû serokwezîr diyar kiribû ku **"Pirsa kurd pirseke vîrtuel (doyayî, sanal) e", "dema ku tu nebê jî, wê demê ji pirsê naye behs kirin", girîngiyek dide daxuyaniyê.** Ev daxuyaniya ERDOGAN a li Amedê ji bo gellek kesan û hêzan hêvî çêkir. Piştî ku ERDOGAN vegeriya Enqereyê cem leşkeran got ku: **"Li Tirkiyeyê yek milet, yek welat û yek dewlet heye"** jî, vê hêviyê dom kir.

Di bangê de rojeva civînê ya vekirî cîh girtî bû. Beriya civînê diyar bû ku rojeva dizî jî heye û ev rojeva dizî, di civînê de jî aşkere bû. Di rojeva vekirî de dihat gotin ku " gelo em kurd dikarin di dema dûrûdirêj de bi hev re çi karî bikin?". Di rojeva dizî de dihat xwestin ku ji bona piştgirîya serokwezîr konseptek û komîteke piştgirî bê avakirin. Di encama civînê de rojeva vekirî bi dengan bi serket. Lêbelê pîvanên ji bo miletê kurd girîng in, di destpêkê de bi piraniya dengan hat red kirin.

Pêvajoya GRUBA XEBATÊ bi vî awayî bi gellek pirsgirêkan dest pê kir. Navê Grubê bi zanyarî wek **"Gruba Xebatê"** hat binavkirin. Lewra li pêş me xebateke dirêj hebû, ji bona ku ew kesên beşdarî civînê bûne, ji gellek aliyan de di nav xwe de xwediyê pirsgirêkan bûn, gerek ev pirsgirêk çareser bibûna. Ji bo yekîtiyê HAK-PAR mînakek bû: HAK-PARê girêdayî pirsgirêkên gellek bingehî, nedikarî yekîtiya xwe biparêze, pêşbikeve û bi gel re pêwendiyên xwe xurt bike. Helbet navê "KURD" jî bi zanyarî, ji bona ku nasnameya millî ya vê xebatê diyar bibe, meşruiyeta civakî û millî ya kurd di xebatê de nîşan bide, hat dayin.

Helbet di nav wê tevliheviya Civîna 4ê îlonê de gelek pirs hebûn ku li ser nehat gengeşî kirin. Ji bona vê hewcedarî bi civîneke giştî, beşdarên wê pirrreng û pirrdeng hebû. Ev civîna, di 17-18. 12. 2005-an de li Diyarbekirê pêk hat.

Di civîna 4ê Îlonê de gengeşî û biryar di ser huqûqa keseyatî re hat meşandin. Vê yekê jî hêvî çêdikir ku ev bibe yekîtiyek hevbeş û xurt, ji partiyeke nû re rê veke. Ez dikarim bibêjim ku ji bo beşdarên civîna 4ê îlonê xeyelên nû çêbûn. Ji bona ku navendiya xebatê di destpêkê de Diyarbekir nebû, min di Komîta Birêvebir de cîh negirt. Hezar mixabin, di xebata Komîta Birêvebir de helwesta grûbçitî rû da. Li Civîna Giştî ya Diyarbekirê grûbçitiyê bi her awayî xwe nîşan da. Li ser vê pirsê gellek gengeşî hatin kirin, lihevkirineke nû hat holê. Hat pejirandin ku **"Xebata GRUBê di esasê xwe de, li ser huquqa keseyatî dimeşe. Lêbelê rastiya grûban jî berçav dike."**

Di 17-18.12.2008-an de bi sedan kes beşdarî civîna Gruba Xebatê bûn. Di civînê de 36 kes wek endamên Meclîsê hatin hilbijartin. Civînê deglerasyonek weşand û di wê deglerasyonê de ji bona ku Meclîs yekîtiyekê ava bike, wezîfe da ser milê wê.

Meclîsa Gruba Xebatê, xebateke fireh pêk anî. Li bajarên Kurdistanê û li bajarên metropolê, gelek civînên herêmî lidarxist. Bi sedan kes beşdarî van civînan bûn. Di van civînan de li ser bername, destûr, model û hiqûqa yekîtiyê gengeşî pêk hatin û pêşniyar hatin kirin.

Meclîsa Grubê, gorî ev bîrûrey û pêşniyarên di civînên giştî de hatibûn ser zimên, reşnivîsa bernameyê û destûrê amade kir. Amadekirina reşnivîsa bername û destûra TEVKURDê bi xebeteke dûrûdirêj pêk hat. Piştî ku reşnivîsa bername û destûrê amade bû, Meclîsa Gruba →

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk : Hevpeyvîn....**

**2-** Dema Gruba Xebatê jî tê de, ji bona TEVKURDê 4 doz hatin vekirin. **Doza 1-emîn** ji aliyê dadgeha Enqereyê de, di derheqê min, A. Melîk Firat (kevneserokê giştî yê HAK-PARê), Fuad Onen (Endamê Meclîsa TEVKURDê), Sînan Çîftyurek (Endamê Meclîsa TEVKURDÊ) de vebû. Ev doza hîn dom dike. **Doza 2-emîn** di derheqê Konferansa Kerkûkê de li Amedê vebû. Di vê dozê de Berdevikê TEVKURDê hat dadgeh kirin. Di dadgehê de berdevikê TEVKURDê Sebahaddîn KORKMAZ helwesteke kurdî û kurdperwerî nîşan da. Pirsa Kurdistanê û mafên neteweya kurd parast. Di encamê de ev doza TEVKURDê beraat kir. **Doza 3-emîn** di derheqê min de, ji bona protesto û rûreşkirina êrişa dewleta tirk li Başurê Kurdistanê, li Amedê vebû. Ew doza hîn dom dike. **Doza 4-emîn** ji aliyê dadgeha Ruhayê di derheqê min, Fuad Onen, Sidki Zîlan (Endamê Meclîsa TEVKURDê), Eyyûp Karageçî (Endamê Meclîsa TEVKURDê), Arîf Sevînç (Endamê Meclîsa TEVKURDê), Nadîr Yektaş, M. Kemal Oguzlu de vebû. Ev doza di 17-ê Hezîranê de li Dadgeha Ruhayê dest pê dike.

Di doza 3-emîn û di doza 4-emîn de ezê parêznameyên xwe bi kurdî pêşkêş bikim.

Di derheqê min de gelek dozên din hene ku dom dikin, beşek dozên di derheqê min de jî encam girtine û li min ceza hatiye birîn.

Ji bona xebatên Partiya Maf û Azadiyan (HAK-PARê), di derheqê min de li Enqereyê, li Wanê, li Merdînê sê doz vebûn. Min di van dozan de bi kurdî parêzname pêşkêş kir. Ji van dozan **du sal û nîv cezayê** min heye û ez li benda biryara dadgeha bilind im.

Ji bona xebatên min yên Komeleya Kurd a Diyarbekirê (KURD-KOMê) di derheqê min de gelek doz vebûne. 3 doz gihîştine encemê. Ji van dozan **3 sal û 9 meh** cezayê min heye. Ez li benda biryara dadgeha bilind im. Min di van dozan de jî parêznameyên xwe bi kurdî pêşkêş kirin.

Ji bona meşa Amedê û Xaburê jî, min **salek û sê meh** ceza girtiye. Ev doza jî li dadgeha bilind e.

Ji bona axiftinên min yên di konferansan de, ji bona hevpeyivînên min yên di kovar û rojnameyan de, ji bona axevtinên min yên di televîzyonan de jî gelek dozên dom dikin hene.

Armanca dewleta tirk di van dozan de gelek aşkere ye, ji aliyê hemû kurdan û dinyayê de jî tê zanîn.

Dewleta tirk naxwaze ku doza kurd û Kurdistanê pêşbikeve. Dewlet dixwaze ew kesên ji bona doza Kurd û Kurdistanê xebat dikin çavtirsî bibin, ew dev ji dozê berdin. Dewleta tirk naxwaze ku siyaseta wan ya derewîn, kolonyalîst, ne mirovane bê deşîfre kirin. Gelê kurd xwediyê mafên xwe yên neteweyî bibe. Kurdistan serbixwe û neteweya kurd azad bibe. Dewleta tirk baş dizane ku dema ku Kurdistan li Rojhilata Navîn bibe dewleteke serbixwe, wê demê rola wan biçûk dibe. Lewra tê zanîn ku neteweya kurd, li Rojhilata Navîn piştî ereban neteweya 2-emîn e. Ev yeka hem dewleta Tirk û hem jî dewleta faris ditirsîne.

Dewleta tirk xwediyê ceribandinan ku piştî serîhildanên Bakurê Kurdistanê serok û têkoşerên Kurdistanê hatine kuştin, demeke dirêj li Kurdisatnê bêdengî çêbuye. Dewletê bi rehetî siyaseta xwe li ser gelê kurd û li Kurdistanê meşandiye. Xebatên ku welatperwerên Kurdistanê dikin, pêşî li dewletê digre.

***3-Ji bo belavkirin û geşkirina xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî li bakurê Kurdistanê, TEVKURD çi karî dike, çi diweşîne, çi planên we di vî warî de hene?.*** →

www.arsivakurd.org

**Dumahîk : Hevpeyvîn....**

binivîsînin

**3-** TEVKURD, yekîtiyeke siyasî ye. Ji bona vê armanca wê yêkem ew e ku hêzên û welatparêzên Kurdistanê bike yek. Tevgerandina wan pêk bîne. Lê ev naye wê wateyê ku TEVKURD ji bona çand û zimanê kurdî xebat nake. TEVKURDê di programa xwe de pejirandiye ku zimanê kurdî li Tirkiyeyê bibe zimanê fermî û perwerdayî.

TEVKURD di qada siyasî de ji bona ku zimanê kurdî bibe zimanê fermî û perwedayî xebat dike. Lewra TEVKURD baş dizane ku dema ku zimanek nebe zimanê fermî û perwerdayî, pêşketin û dezgehbûna wî zimanî nabe. Ji bona vê TEVKURD, propagandayê vê yekê bi xurtî, bi riya çapemenî dimeşîne.

TEVKURD, ji bona ku dezgehên ziman û çanda kurdî pêşbixin ava bibin, dibe alîkar. Ji nivîskarên kurd re piştgirî dike. Kursa zimanê kurdî dimeşîne. Dezgehên heyî yên ku ji bona ziman û çanda kurd xebat dikin re jî alîkar e.

***4-We hewil dabû ku hun berevaniya xwe devkî û nivîskî bi zimanê kurdî pêşkêşî dadgehê bikin. Sedema wê çiye ku we xwestiye bi zimanê kurdî li dadgehê bipeyivin û bixwînin ne bi zimanê Tirkî?.***

**4-** Baş tê zanîn ku piştî şerê-sar li Tirkiyeyê û li Kurdistanê jî gelek guhertin hatin holê. Vê guhertinê li ser stratejî û awayê xebata me jî tesîr kir. Xebata kurd û Kurdistanê ket nav welêt û bajaran. Ez girêdayî van guhertinan vegeriyam Kurdistanê, min biryar da ku xebeteke vekirî, bêîttiatkar bimeşînim.

Di merheleya yekem de ji bona ku li Tirkiyeyê dewlet bibe dewleteke federal, dewleta neteweya Kurd û Tirk, Kurd li Kurdistanê bibin xwediyê dewleta xwe ya federe min stratejiyek pejirand.

**Li dadgeha bi kurdî axevtin û parêzname pêşkêş kirin beşek ji ev stratejiya min a bêîttakariyê ye.**

**Sedema duyem** ew e ku ez dixwazim di dadgehên tirkan de îspat bikim ku zimanê kurdî heye, zimanekî xurt e û zimanê ilîm e.

**Sedema sêyem** ew e ku bi kurdî li her derê û li dadgeha axevtin, mafê min e. Divê ez tehemûlî encama kurdî axevtina xwe bikim.

**Sedema çarem** jî ew ek ez dixwazim di nav rewşenbîr û hiquqzaneyên kurdan de tirsê bişikînim.

**Sedema pêncem** jî ew e ku dema li dadgehan parêzer û girtiyên kurperwer bi kurdî rêvebirina dozên xwe bikin, dewleta tirk ji aliyê siyasî û malî de dikeve zehmetiyek û tengesiyeke gelek mezin.

***5-Rewşa axaftin û nivîsandina bi zimanê kurdî li bakur di çi warî de ye û hêviyên we çine?.***

**5-** Pirsa girîng ew e ku ji bona zimanê kurdî li Bakurê Kurdistanê konseptek û siyaseteke diyar û hevmişterek derdikeve holê. Ji bona ku zimanê kurdî bibe zimanê perwerdeyî, di nav hemû kurdan de hevmişterekiyek heye. Ji demên berê zêdetir giringiya zimanê kurdî tê fahm kirin.

Li Bakurê Kurdistanê axevtin û nivîsandina kurdî pêşdikeve. Gelek rojname û kovar bi kurdî tên weşandin. Dezgehên Kurd, êdî zimanê kurdî wek zimanê fermî dipejirînin. Gelek rewşenbîrên kurd bi kurdî dinivîsinin. Pirtûkên kurdî bi hejmar zêde dibe. Di mîhracanan de ji hemû beşên Kurdistanê beşdar bi kurdî qise dikin, kurdên bakur bi kurdî qise dikin. Kursên zimanê kurdî zêdetir dibin. Konferans, panel, semîner bi kurdî tên meşandin. Di televîzyonan de gelek qels be jî hewildanek heye.

Ji bona vê ez hêvîdar im ku di rojên pêş de zêdetir kesê kurdî biaxifin û bi kurdî.

**D.R. (11)**

www.arsivakurdi.org

# Rapora salane

## Rêz û silav ji hemî beşdaran re ………………!

## Mamosteyên hêja………!

**Ev rapor di civata salane ya yekem a piştî damezrandina saziya fêrkirin û parastina zimanê Kurdî li Sûriyê de hate xwendin.**

Berî hertiştî em neçarin van pirsan tim û tim bi bîra xwe bînin , pirsa hebûna gelê Kurd û rola zimanê kurdî di wê hebûnê de @....Rewşa ku, gelê Kurd tê de dijî çawa û di kîjan pile û asteyê de ye @....Çi pilan ji nebûna wî re têne gerandin @....Çekên berxwedanê ji bo hebûnê li ba Kurdan çi ne @....Giringiya parastin û fêrkirina zimên pileya çendê distîne @....Ji zimanî kurdî kîjan zarava , Kurmancî, Soranî , lê, zazakî @....Lê, na ne ev û ne ew ….Ji dêvla yên kurdî , ne xeme em berê xwe bidin zimanên serdestan Erebî, Farisî , Turkî @.... Hêviya me ji vê pêşgotinê ewe Ku, em pêçana zimên ji nû ve vekin û giringiya parastin û fêrkirina ziman. kurdî bînin bîra hevdû , û bi hev re li bersivên wan pirsan bigerin. Ji ber ku, em di cîhaneke tijî çandeyên curbecur û têkel de dijîn û hemî jî bi hev re , li deriyê mejiyê me didin û dixwazin vê re di têkildariyê kevin û biguhêrin. Vêca, pêwîste ku, çawa em dê li hember yên dixwazin kesayetiya me ya netewî tune bikin rawestin@.

Hevdema ku, Kurd tê de dijîn , ji hemi aliyan ve , hevdema şûndamayînê ye . Li rex wê , em jaliyê zeftkarên welatê me ve bindestin jî . Vê rewşa kambax û kirêt , nehişt ne civak , ne hiş û ne jî aboriya me pêş ve here. Wêlomê jî , em bi dû qaliqê Pêşketinê dikevin û naveroka wê jî davêjin alîkî .Wek nimûne , em ji demokrasiyê hezdikin , lê , em nikanin demokras bin , em pir tiştên baş di peyvkirinê de bi kar tînin lê… di karanînê de , bi kar nînin. Yanê. em pir gotgotin , lê, kêm kirde ne. Di rewşeke weha de, em çiqas bi wekhevî , demokrasî , dadmendî[ aştî û mafên mirovan bang bikin ; têkeliya Ereb, Faris û Tirkan bi Kurdan re , wê wek yê Alman , Firansî û Îtaliyan di Siwêsre de nebe @!.

Di çerxa cîhangeriyê de , em. xwe û gelên cîhanê yên serdest û xwedî dewlet bi ber hevdûdin û raberî hev bikin.

Gelên serdest û xwedî dewlet li cîhanê bi ser ku, bi sedan sal li pêş me ne , ew hewldidin ku, kesayetî , çand , gerdîş û zimanê xwe biparêzin . Wek nimûne :

-Ebdela pêşew di mijareke xwe de dibêje :

**1-** Min çiqas hewil dikir ku, ez bi nivîskarên Estonî û Beltîqî re bi zimanê Rûsî baxêvim ; ew ji peyvandina bi zimanê Rûsî direvîn .

**2-** Siwêdî 6% ji niştîmanwarên Filnende ne ,Otonomiyek wan , ala wan, Perleman û distûrek wan î navçeyî heye û têkildariyên bi derve re hene . Ji bilî wê , leşkeriyê Jî Filnende re nakin û zimanê wan li tevaya Filnen de , zimanekî fermî ye . Lê, tucarî tu yekî Siwêdî nabînî ku, bi yekî dinî Siwêdî re – xwedê neke - yan bi zarokê xwe re bi Filnendî dipeyive , yan jî wan dişîne dibistaneke Filnendî.

Li gel herdu nimûneyên jorin , piraniya gelên serdest yên xwedî dewlet jî mîna Ereb, Turk û Faris , ji wendabûna zimanê xwe bi tirs in û hewl didin ku ,biparêzin .

Lê, em Kurdên bêçare û belengaz , yên ku, ji hemi aliyan ve , li ber gef û gurên serdestên paşdemayî derin û tên - ewên ku , navên me, welat û gundên me diguhêrin , ziman. me qedexe dikin û hebûna me tune dikin - ji dêvla em ji gelên serdest bêtir , çand û zimanê xwe biparêzin , em bervajî wan dixebitin ⟶

www.arsivakurdi.org

## Zimanhezên hêja……….!

Rast e , rewş û deraqê gelê me weke me li jor diyar kirî , ne xweş û li saz e . Lê , em dikarin bibêjin ku , ev bûneya bûneyeke pîroz e . Beşdariya kesên weke we zimanhez û bi rûmet di vê civata salane ya yekem de , piştî civata damezrandina Saziya fêrkirin û parastina zimanê kurdî li Sûriyê , li 3.4 . 2007an , bihna mirov fere dike , û hêviya hebûna zimên û Kurdayetiyê bilind û geş dike .

## Xwîşk û birayên delal…….!

Tucarî xebata we ya fêrkirina zimanê kurdî , bi awakî rêk û pêk di çarcewa S.F.P.Z.K.s de , ne karekî biçûk e . Belê , ew li cem mirovên dûrbîn , karekî zor mezin û pîroz e . Ji ber ku , çi xebata di ber zimên de be , xebata hebûnê li hember nebûnê ye . Ne hewceye em pir di vî warî de dirêj bikin , ji ber ku , em bawerin ku , hemî beşdar têdigihên giringiya pirsa zimanê kurdî di jiyan û hebûna gelê me de . Wêlomê jî , parek ji wext û jiyana xwe dane fêrkirin û parastina zimanê dê , û îro li vir hazir in .

## Nirxandina xebat û calakiyên Saziyê li dirêjiya salekê :

Piştî borandina bêtirî salekê di ser damezrandina saziya me re , pêwîste em kar , berhem û calakiyên saziyê ji hev re berbiçav bikin û binirxînin , pesnê qenciyan bidin , qelsiyan lome û rexnekin , û pêşinyaran ji paşerojê re pêşkêş bikin . Di vî warî de , em dikarin bêjin : Mamostên saziyê yên rêzimên ( 18 ) in , mamostên alfebê ( 59 ) in , Şagirtên rêzimên yên fêrname wergirtine ( 47 ) in , Şagirtên alfabê yên fêrname wergirtine ( 459 )in , şagirtên rêzimên yên bi dawî nebûne ( 22) ne , şagirtên alfabê yên fêrbûna xwe kuta nekirine ( 51) in . ( 5 ) şevbuhêrk bi navê saziyê li ser pêwîstî û giringiya zimên hatine li darxistin , û komîta rêvebir ( 5) civat girêdan . Namak vekirî rexneyî bi navê saziyê , R. Newroz , Munteda Nûredîn Zaza ya çandeyî û kovara Pirs li ser biryara bikaranîna alfebeya erebî ya Perlemana Kurdistana Îraqê ji kek Mesûd , perleman û hikometê re hate rêkirin . Namak vekirî bi navê Saziyê li ser yekirina rojmêra kurdî ji gelek cigehên entirnêtê re bi rê bû , û di rojnama Newrozê de belav bû . Daxuyana damezrandinê wergerî erebî û Ingilîzî . Tozik wergerî erebî . ( 25 ) pirtûk rêzimên ya Dr. Kamîran Memê Alan û Dr. rozad hatin çapkirin . ( 500 ) pirtûk rêzimên ya Rozad Elî hate kirîn . ( 300) pirtûk ya destpêka rêzmên ji bo saziyê hate kirîn . ( 800) Alfebe hate çapkirin . Simbolek ji bo Saziyê amede bû . Kulîkek ji zimên bi navê Saziyê ta ( 4000) hejmar li ser riya çapkirinê ye . Û ji bilî gelek xebatên devkî yê nirxbuha di mal , civat , û ciyên kar û xwendinê de li ser giringiya bikaranîna zimanê dê li şûn zimanên biyanî . Li rex van karên hêja pêdivî û gerekîn hebûn em tê de bi ser neketin. Vêca em ji bo wê loman ji xwe dikin. 1- me nikanî bingehek ji Saziyê re li Şam , Reqê û kobaniyê avabikira. 2- Herêmên dî weke herêma Heleb nikanîn tu çalakiyên aborî ji bo danheva sermiyanekê ji xwe re bikirana

Vêca pêşinyarên me ji bo paşeroja Saziyê ev in:

1- Di sala bê de , xebat ji bo jiholêrakirina kêmasiyên jorîn.

2-Pêwîstiya amedekirina pirograma kar jaliyê komîta rêvebir ve.

3-Çêkirina komîteyên pisporî ji aliyê komîta rêvebir ve , ji bo hêsankirina karê Saziyê di rojên pêş de .

**Dawiya Hizêranê**

**Komîta rêvebir**
**Ya S.F.P.Z.Ks**

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk : 51saliya ...**

hatiye guhartin , jiyan û berjewendiya xelkê me yê kurd li Sûriyê baştir hatiye zelalkirin ku , ew parek ji jiyan û berjewendiya civaka Sûrî ye û çendî heyameke erênî , şaristanî , mirovane û demokratîk li Sûriyê peyda bibe , ewqas rê li ber xebata kurd vedibe , û çareserkirina pirsa kurd a netewî bi şêweyeke demokratîk û aştiyane nêzîk dibe . Lewre jî , mirov di wê baweriyê de ye ku , li gor vê dema nû û evqas guhartinên mezin û bingehîn ên ku di hemî waran de hatine holê , pêdivî , pêwîstî û gerekiyeke dîrokî ye ku , hemî rewşenbîr , rêxistin û partiyên siyasî li xwe û programên xwe vegerin , da ku bi mêjiyekî vekirî , bi nêrîneke rexneyî , bê tirs û dudilî bifikirin û li nêrînên xwe bi azadî bibine xwedî …Gelo partiyeke kurd li Sûriyê divê hebe an ne ?. Ew dê karibe çi bike û çi biserxîne û bi çi şêweyî bixebite ?. Da ku bi rastî karibe bi parêzerê berjewendî û rûmeta gelê xwe be , ne çi durişiman hilde an gotinên mezin û qelew bike **Sînorê Yekta**

*******************************************************************.

**Dumahîk : Hevpeyvîn....**

Şik nîne ku divê hemû tevgerên beşên Kurdistanê ji hev re bibin alîkar. Lê divê ev alîkariya baş bê sînor kirin. Rojavayê Kurdistanê her dem ji bo beşên Kurdistanê fedekariyên mezin kiriye. Ez jî 7 salan li Rojavayê Kurdistanê mam. Ez rewşa kurdên Rojavayê Kurdistanê baş nas dikim. Ez fedekariya wan baş dizanim û ji bona vê Rojavayê Kurdistanê ji bona min xwediyê taybetiyekê ye.

Tevgera Rojavayê Kurdistanê piştî serîhildana 11-Ê Adara 2004-an, hat merheleyeke girîng. Ji bona vê divê hûn giranî bidin xebata xwe. Lewra sîstem û rejîma Suriyeyê mecbûr e ku bê guhertin.

Divê em guhertinên li dinyayê, li herêmê, li Kurdistanê pêk tên bişopînin û wan fahm bikin. Ji van guhertinan ders derxin.

**Bakurê Kurdistanê/Amed, 14. 06. 2008brahîm GUÇLU**

***Sipas birêz Ibrahîm Guçlu, hêviya serkeftinê ji gelê kurd re dikin***

***6-Hun dixwazin çi xwendevanên kurd re li ser rûpelên NEWROZê bêjin?.***

**6-** Ez, di destpêkê de ji bona gelê me li Rojavayê Kurdistanê û xwendavanên **Newrozê** serkeftinê dixwazim. Welatê me bi destê dewletên kolonyalîst hatiye parçe kirin. Ji bona vê em mecbûr bûne ku jiyaneke ji hevûdu cihê bimeşînin û welatê me jî bûye kolonî. Gelê me ji hemû mafên xwe yên grubî yên neteweyî (Başurê Kurdistanê ne tê de) bêpar e.

Ev rewşa parçebûna welatê me bûye sedem ku li her beşeka Kurdistanê têkoşînek û stratejiyeke cihê bê meşandin. Ev jî tiştekî gelek xwezayî ye. Divê em li her parçeyekê giraniyê bidin ser xebata xwe. Em nebêjin ku pêşî em parçeyeke din azad bikin, pişt re parçeya xwe azad bikin. Di van salên dawî li Rojavayê Kurdistanê di vê pirsê de xeletiyên gelek stratejîk hatin kirin, ciwan û rewşenbîrên Rojhilata Kurdistanê dev ji xebata xwe ya li Rojavayê Kurdistanê berdan, beşdarî xebata Bakurê Kurdistanê bûn. Divê ji vê şaşiyê dev bê berdan.

www.arsivakurdi.org

.

# NEWROZa me
# Û şivantiya Elo

**Serdarê Bedirxan**

-

Kekê Reşo, ka hejmara me ya dawî ji Newrozê bi ser hev de nehat, ma ne dema wê nêzîk bûye, xwendevan li benda wê ne?.

- Ho birawo, ho birawo, bawer bike ezê dev ji vî karî berdim, ez nema karim…Hê ji wan berhemên ku te ji min re şandine pê ve, tiştek ji min re nehatiye…Her roj, her şev, ez dengê xwe digihînim wan camêran, ew nivîsên xwe ji min re rênakin…

Bi van peyvan, kekê Reşo goina xwe bi dawî anî.

Eve ne cara pêşîn bû ku hevalê min Reşo dilsariya xwe ji derengiya rojnameyê aniye zimên, gilî gazinên xwe kirine û gotiye “ezê dev ji vî karî berdim”, lê, her ew bi xebata ziman û çanda gelê xwe ve girêdayî ye, ew nikare jê dûr bikeve, tenê, ew kela dilê xwe bi vê gotinê hênik dike. Gotina hevalê min, çîrok şivantiya Elo anî bîra min, ezê wê ji xwendevanên Newrozê re pêşkêş bikim:

Dibêjin, li devera Botanê, şivanekî qewlek bi gundekî re danî ku ew şivantiya wî gundî bike, dem derbas bû, qewlê şivên nêzîk dibe, wî ji gundiyan re got: Eve qewlê min û we nêzîk bûye, bi hêvî me hun ji xwe re şivanekî din bibînin, ji ber ku ez nema li gundê we şivantiyê dikim. Hingî şivan mirovekî dilsoz û qenc bû, guh li pezê gundiyan dikir, baş ew diçêrandin, li ser destê wî pez qebilî û qelew bûbû, destê gundiyan jê nedibû, hema jê re digotin: Em li şivanekî digerin, ku me dît, oxira te ya xêrê be, lê, di rastiyê de, ew li tu şivanan ne digeriyan. Roja qewlê şivan bi dawî dibû, bang dikir: Gundîno…!! tu kes pezê xwe bernrde, qewlê min qediyaye, ez nema diçime ber pêz, dihate xanîkê xwe, di kulekê re li bênderan temaşe dikir ka gelo wê gundî pez berdin yan na. Gundiyan, pez berdida ser bênderan û vedigeriyan malên xwe karên xwe dikirin, ewî didît ku mih, bizin, kehrik… virde dibezin, wired dicing, ziyanan dikin, hin dikevin nav nîskan, genim, ceh û nehkan… Bi lez û bez wî careke din radihişte darê şivantiyê, bê vîna wî, rojeke nû ji qewlekî nû dest pê dikir..!!

11.07.2008Z-2620 K

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurdi.org